

Vakslêdana parastinê

Rênasiya vakslêdana gelekzimanî



Das Gesundheitsprojekt
Mit Migranten
für Migranten



MSD

INVENTING FOR LIFE

*Ethno-
Medizinisches
Zentrum e.V.*



Impressum

Schutzimpfungen – mehrsprachiger Impfwegweiser
Mehrsprachiger Wegweiser zum Thema Impfen für
Migrantinnen und Migranten in Deutschland

Herausgeber: Ethno-Medizinisches Zentrum e.V.
Königstraße 6, 30175 Hannover | Deutschland
info@ethnomed.com
www.ethnomed.com

Redaktion und fachliche Unterstützung: Dipl.-Sozialwiss. Ramazan
Salman, Dipl.-Sozialwiss. Michael Kopel, Dipl.-Psych. Ahmet Kimil,
Dr. med. Matthias Wienold (Ethno-Medizinisches Zentrum e.V.),
Dr. med. Gerhard Pallasch (Kreisgesundheitsamt Stade)

Wir danken der Firma MSD SHARP & DOHME GMBH für die freundliche
Unterstützung bei der Realisierung dieser Broschüre. Weitere
Informationen zum Unternehmen finden Sie unter www.msd.de.

Lektorat/Gestaltung/Satz: Bernd Neubauer

Übersetzung: Dolmetscherservice Ethno-Medizinisches Zentrum e.V.

Abbildungsnachweise:

Abb 1: © Eckhard Fischer, Muldenstein

Abb 2: Cynthia Goldsmith, Centers for Disease Control (USA); ID 8243

Abb. 3–7: Ethno-Medizinisches Zentrum e.V.

Abb. 8: nach STIKO Epidemiologisches Bulletin, Heft 34 (2017)

Abb. 9: modifiziert nach Janeway CA et al. Immunobiology,
6. Auflage (2005), Garland Science

Bildquellen: S. 1, 10, 12, 15, 27, 33 © Fotolia.com

Der vorliegende Wegweiser ist für eine breite Öffentlichkeit
vorgesehen. Um die inhaltliche Richtigkeit zu gewährleisten,
sind alle Rechte vorbehalten. Eine andere Verwendung als
im gesetzlich festgelegten Rahmen bedarf der vorherigen
schriftlichen Genehmigung durch das Ethno-Medizinische
Zentrum e.V. Bitte schreiben Sie uns.

Dieser Wegweiser ist in 16 Sprachen erhältlich:
Albanisch, Arabisch, Bulgarisch, Deutsch, Englisch, Französisch,
Griechisch, Italienisch, Kurdisch, Persisch, Polnisch, Rumänisch,
Russisch, Serbokroatisch, Spanisch, Türkisch

6. Auflage

Stand: März 2018



Peyva bixêrhatinê

Xwendevanên dilovan,

Xizmetguzariya baş ya tendurustiyê ji hêla penaberan ve, daxwaza siyaseta bingeîn a tendurustî û pêkvejiyanê ya hukumeta Elmaniya li dar dixê. Armancên destnîşankirî û pîvandar, di çarçeweya vê çalakîyê de, ku rewşê baştir bike, di program û plana çalakîya pêkvejiyanê, ya welatê Elmaniya de hatiye bicihkirinê. Di halê hazir de, tişt a pêdivî di warê tendurustiyê de, ku ji bo penaberan bête kirinê, hîna têrê nake. Kem û kurî û kêmasî di agahîyan û di rewşên kirinê de, her weha rêgirên di sistema tendurustiyê de, wek sedemên sereke têne binavkirinê hene. Di herdû beşan de, gavên berbi pêş ve hatin avêtin.

Ev rênas û rênişandera vaxslêdanê ya bi gelek zîmanan, dikare bibe stûneke gelek baş di xizmetkirina tendurustiyê de bo penaberan li Elmaniya. Parastin û parêziya tendurustiyê vekirî û liberçav, di erkên welat yê yasaya bingeîn de, hatine bicihkirinê. Stûn û karê bigehîn ku hatiye danan, ew e ku para her hemwelatîyekî, di Vaxslêdanê de hebe. Ne xweber e, ku vaxslêdanên parastinê, parçeyekî fermî di kataloga xizmetê ya sîgorta nexweşiyê de ye. Ji ber wê jî, karmendên tendurustiyê yê wîyaletan, li gor pêşniyarên komîteya vaxslêdanê ya bi ser peymangeha Robert-Koch ve ne, kar dikin û li ser wê bingeînê katalogên, ku cureyên vaxslêdanê têne pêşniyarkirin, têde têne weşandin.

Wergirtina hemî cureyên vaxslêdanê li welatekî, nîşaneke giring e, di xizmetkirina tendurustiyê de. Bilindkirina rêjeya vaxslêdanê di nav xelkên ku pêşmalbatên wan penaber in, de û bi taybetî zarok û gencan, armanceke giring e ya plana çalakîya welatî ji bo pêkvejiyanê. Amadebûna ji bo vaxslêdan, bigişti baş e, lê kemûkurî hîn jî di ronîkirin û gihandina agahîyan de bo cihên pêdivî hene.

Navenda Tendurustiya regezan (Ethno-Medizinische Zentrum), ji sala 1989an ve, bi karê ku mijarên siyaseta tendurustî û ji hêla kultûrî ve hestiyar bo penaberan dike. Navberkarên tendurustiyê li sersanê Elmanîyayê projekte *Mit Migranten für Migranten* = ji penaberan bo penaberan yê Vaxslêdanê, serpêhatîyên wan digel bi serketî ne. Navenda Ethno Medizinische Zentrum vê rênişander û rênasa Vaxslêdanê bi belavkirina bi 16 zîmanan stûnekî din yê bingeîn û pêdivî bo xizmetkirina tendurustiya koçber û penaberan dideye. Bi hêviya ku ev rênasa Vaxslêdanê bi şeweyekî fereh bête berbelavkirin.

Hermann Gröhe
Wezîrê dewleta Elmaniya yê Tendurustiyê



Pêşgotin

Xwendevanên dilovan,

wateya penaberiyê jiyana biliv e. Ev civata global ya îroyîn nimûneya zêdebûna imkana ye, ku mirov bilive. Ji ber xurtbûna rêkên gihandinê yên navnetewî, ku gelek mirov ji gelek hêlên dinyayê, ji gelek welatan tên û digihin hev, weha jî di bin sîbera van têkiliyan êş jî ji cihên dûr peyda dibin û dikarin zû

bi zû berbelav bibin. Di vê pêvacoyê de, vaxslêdanê di warê tendurustiyê de, ku cihê metirsîya welatan e roleke berbiçav dilîze: Tevdîrên parastinê yên tendurustî, dikarin her hemwelatîyê biparêze, ji wê bêhtir dikare bibe dîwarekî bihêz li dijî berbelavbûna hindêk nexweşiyên taybet li nav hemwelatîyan.

Bi vê boneyê çavdêriya kêmasiyên vaxslêdanê di nav penaberên li Elmaniya dijiin de tête kirin. Weha bo nimûne, ew zarok ên, ku li welatên xwe jidayik bûne û di temenekî biçûk de li Elmaniya binecih bûne, di dema ketina xwendegehê de zorbeyî caran diyar dibe ku vaxslêdanên wan kêmtir in. Yek ji wan sedemên sereke, gelek caran diyar dibe ev kêmasiya han netêgehiştin û zanîna zimanê elmanî ye, digel ku eve salên dirêj in li vir dijiin an jî nû hatibin û ev dibe rêgir, ku ew xizmetên tene pêşkêşkirin di warê sîstema tendurustiyê li Elmaniya de ji wan sûd wernegire.

Wek hun tê tînin der, ku vaxslêdan netenê babeteke bo vaxslêdana zarokan, belê bo her temenkî jî heye. Em dibînin, ku kartêkirin û tenahî ya vaxslêdanê ta demekê tête guftûgokirin û guman li ser çêdibe ev jî mirov tevlihev dike ji ber wan agahiyên şaşwergirti, lewra jî pêdivî bi pêşkêşkirina agahiyên hemereng kurt û cihgirtî heye.

Em bihêvî ne, bi vê rênasa liberdest bikaribin kêmasiyên agahîyan di biwarê vaxslêdanê de bi zimanê dayikê dagirin û bi vê rêkê erkên xwe bicih binin, daku penaber derziyên vaxslêdanê li xwe bixe bi wê sûdwergirtinê be mîna wan pirriyan yên bi zimanê elmanî dizane.

Ramazan Salman

Berpirsê navenda tendurustî ya – regezan/ rêvebirê MIMI-projektê tendurustiyê

Naverok

Mikroba nexweşiyên infeksiyonî û rêkên parastinê	6
Bingehên vaxslêdanê û dermanên wê.....	10
Pêşniyar bo vaxslêdanê û bihayê (fiyata) wê.....	11
Salnameya Vaxslêdanê ya 2017an, ya -STIKO.....	12
Ji bo risk û komplikasyonên vaxslêdanê	14
Wateya civakî ya Vaxslêdanê	16
Pîrê praktîk yê li ser vaxslêdanê	17
Nexweşiyên giring yê bi sedema vaxslêdanê pê nayên ketin	20
Têgehên pispor yê herî giring*	25
Adrêşên giring yê pisporiyê wî biwarî	28
Plana vaxslêdanê ya min bixwe	32
Ya girig bi kurtasî	34

* Di vî deqî de çend têgehê bi nivîsa **şin** hatine nivîsîn. Hun ê vê ji rûpelê 25an de wek kurteşirovekirinan bibînin.

Mîkroba nexweşiyên infeksiyonî û rêkên parastinê

Sedema nexweşiyên Infeksiyonî çine?

Gelek **nexweşiyên Infeksiyonî** ji sedê salan ve naskirî ne. Encamên bixwe li ser sedemên wan nexweşiyên hîn nû ne. Demeke dirêj mirovan agahiyên nerast an jî nedestnîşankirî hebûn. Hinek ji wan agahiyên şaş bi wan navan îro jî rûdidin. Bo nimûne peyva Malaria ji îtalî hatiye û wateya wê ya peyvê „bayê xerab“.

Bêhtirîn nexweşiyên Infeksiyonî ji sedemên **Vîrus** û **baktêriya** pêk tên.

Baktêri


Mirov di bin navê baktêriyan de bûnewerên bi şanekê fehem dike (Şikil. 1), gelek biçûk in, ku mirov wan bi çavan nikare bibîne. Gelek ji wan baktêriyan erkên giring pêk tînin û ji bo gelek fonksiyonên bedenê wekî sistema hezmê, parastina ji nexweşiyên fungalî ji bo xwedimalê hevcene. Ji bê wana derfetên jiyane nîne.



Şikil. 1: Wêneyê Komputerê yê bakteriya xendikokê (*Bordetella pertussis*)

Virûs

Vîrus hîn ji baktêriyan biçûktir in. Di serê derziyê de gişt 8 billion Virûsê persivê cih digrin (Şikil. 2). Virûs dikarin derbasî şanên mirovan bibin û wan ji bo zêdekirina virûsan mecbûr bikin Ew dibe sedema xerab kirina şanên ku ew dikevinê.



Şikil. 2: Wêneyekî mikroskopa elktronan ji Virûsê persivê

Infeksiyon çiyê?

Di bin navê Infeksiyon an jî Infeksiyona laşê mirova têdigehe ku di laşê mirovî de mikrob bicih û pirr bûne (bo nimûne Baktêriya û Virus). Tenê ispata mikrobekî di laşê mirovda (infeksiyon) ne nexweşiyêke.

Lê gava kû ew mikrob di laşa mirovda dibin sedema nişanên (Symptomen) wekî ta, xwenebaşdîtî an jî nişanên li ser cerm wekî sorbûn, wê caxê jî infeksiyon dibê nexweşiya infeksiyonan.


Yê ku li pê infeksiyonan bikeve dikare mirovê din jî pê bixe û nexwes bike, bêt ku ew bixwe zanibe ku nexweş e an jî ji vegirtina xwe hayedar be. Jiber wê jî nexweşiyên vegirtinê zû berbelav dibin.

Mikrobên nexweşiyê Çawa tene guhestin?

Ji bo infeksiyona rêkên veguhestinê û belavkirinê wateyeke wê mezin heye. Bitinê dema hijmareke mezin ji mikrobên bêtêkçûn derbasî laş bibin, dikare bibe nexweşiya infeksiyonan. Rêkên veguhestinê yê cuda bi mikrobên û nexweşiyê ve pabend in.

Infeksiyona dilopî

Dema pişkandin, kuxik, axaftin û hilimkêşan û berdanê nuqutên şilavê azad dibin, dikarin mikrobên werbigirin. Li gor mezinbûna dilopan çendî wana dirêj nav hewayê dimînin û dikaren li gel hilmê mirovên din jî nexwes bike. (Şikil. 3).




Şikil. 3: Infeksiyona dilopî

Veguhestina di rêya destav-dev re

Hinek mîkrob bi destava mezin re derdikevin û li derdoran belav dibin. Bi taybetî di welatên ku asteya pakijiyê nebilind mîkrob di ava vexwarinê de hene. Her kesekî, ku avê vexwe, xwarina nekelandî an jî meyweyê ne qeşaltî bixwe, dikare ku êş wî vegire.

Infeksiyona lepax


Gelek caran nexweşî nerasterast tên Veguhestin. Nexweşî berya hemî tiştî di rêya dest an jî mijadan(heyok), bi taybetî ew yên deravêtiyan dikarin bîn belavkirin û mirovên din jî nexweş bikin. (Şikil. 4). Mîkrobên ku zikêşê û hindûrçûyîne çêdikin xwedîyê berwedêriyê mezinin. Hijmara wan kêmtir be jî dikarin mirovan nexweş bikin.



Şikil. 4: Infeksiyona lepax – veguhestina di rêya destav-dev re

Infeksiyona bi Kontak (hingavtin)

Hinek mîkrob di rêya hingavtina laşî re çêdibe bo nimûne bi maçîkirinê an jî bi rêya sex têne veguhestin (Şikil. 5). Veguhestina nerasterast di rêya destmalê an jî kursiyên destavê kêmtir çêdibe.



Şikil. 5: Infeksiyon bi hingavtinê

Veguhestin di rêya kêzik (inzekt) û bûnwerên jîndar yên din re

Gelek nexweşî hene kû kêmtir ji mirov bo mirov têne veguhestin. Ji bo belavbûna xwe ew hevcedariya guhêzbarekîne. Bêhtirîn ji guhêzbaran kêzik in. Dema pêşiya taya zer tibayekî gez bike, infeksiyon bi rêya xwînê dibe. Eger derengî gezeke li mirovekî da, ew dikare di eynî dem de pê re bibe sedema vegirtina Vîrusa-taya zer.

Xwîn û şilaviyên laş yên din


Hinek mîkrob hene xwe bi rêya xwînê (Şikil. 6) an jî şilavên din yên nav laşî mîna tûk, histêr, avikê û ava ji vajina dertê belav dibe. Hingavtina laşî ya nêzik wek infeksiyona bi hingavtinê roleke wê mezin heye. Infeksiyona bi rêya rehên xwînê (guhestina xwînê) li Elmaniya kêr dibe, ji ber xwîn gelekî di bin çavdêriyê de ye. Gelek caran di rêya guhestina xwînê re, di dema ducaniyê de, jiber gera xwînê ya dayik û zarok bi hev ve gelek girêdayî ye.



Şikil. 6: Veguhestin di rêya xwînê re
Ev di dema ducaniyê de

Infeksiyona bi rêya birînê

Di birîndariyê de gelek caran mîkrob dikevin nava birînê û dibin sedama infeksiyonan. (Şikil. 7). Ji bo nexweşîya infeksiyonî menzimbûna birînê ne gerîngê. Wek minak eger mirovek bi qîtê gulê xwe birîndar bike, dikare bi nexweşîya tetanûsê (kuzaz) bikeve.



Şikil. 7: vegirtina bi rêya birînê

Bingehên vaxslêdanê û dermanên wê

Vaxslêdan çi ye û çawa kar dike?

Vaxslêdan dihêle hêza berxwedanê ya mirov beramber sedemên metirsîdar bi taybetî Baktêrî û Virusan çalaktir bike. Her usa ji ew dikarin mirovan li ber hindek komplikasyonên nexweşîyan, seqetiyên laş an jî derûnî yê metirsîdar jî piparêzên.

Gelek mirov hene li dijî gelek nexweşiyên infeksiyonî vaks li xwe dane, ev jî nahêle ku gelekî berbelav bibe. Bi sedema karekterên guhêrbar yê vaxslêdanan mirov ji Vaxslêdana parastinê diaxive. Di dema niha de li Elmaniya vaxslêdan jibo parastina 25 nexweşiyên infeksiyonî bi kar tên.

Rêbaza vaxslêdanê birastî hêsane:

Mikrobên qelsketî an jî yê mirî dibin parçeyek ji dermanê vaxslêdanê. Sîstema parastinê ya mirovan wan mikrobên mirî yê vaksê wekî mîkroba nexweşîya „normal“ nasdikê û li dijî wan mîkroban li gel şaneyên parastinê **antîkor** û **şanên hizirkirinê** ava dikin.

Gava kontak bi mikrobên rastî di demki paş vaxslêdanê da ew antîkor yê kû hatinê çêkirin bedenê wê gavêda diparêzin. Şanên hizirkirinê ji bo parastina ji mîkroban di demeke dirêj berpîrsîyarî.

Her çiqas kartêkirina vaxslêdana gelek serfiraz be ji ew mirovan % 100 nikare biparêze.

Dermanê Vaxslêdanê çawa tê bikarannîn?

Dermanê vaxslêdanê dikare bi gelek reyan bikar bîn. Zêdetir ew derzîyan, di tevna bin çerim, di tevna masulkanda an jî di çerm de bikar têt. Tenê hindik dermanê vaxslêdanê hene ku tene vexwarin an ji xwarin.



Pêşniyar bo vaxslêdanê û bihayê (fîyata) wê

Kî biryarê werdigire kû ji diji çi û kengî vaxslêdan bê cêkirin?

Li Elmaniya vaxslêdan ne mecbûrî ye. Her yek dikare biryara xwe bide piştî şirovekirina li gel doktor bike û vaxslêdanêke estnîşankirî bo xwe yan jî zaroka xwe baş bibîne. Ev biryareke azad û takekesane ye.

Komîsiyona vaxslêdan li peymangeha Robert-Koch (RKI) herdem bi pîrsa kîjan vaxslêdan jibo kê û kengî hevce û basê pêva mijûle (kurti: **STIKO**). Endamên STIKO hemî doktor û pisporên din in, ku ji hêla wezarata tendurustiyê ya Elmaniya ve têne gazîkirin. Endametî di STIKO de karekî erkê şahnaziyê ye. Endam serbixwe ne û biperpirsiyarî erkên xwe cihbichî dikin.

STIKO hersal pêşniyarên bo vaxslêdanê nûjin dike, bitaybetî **salnameya vaxslêdanê** (Şikil. 8, binêre r 12/13).

Ev rûpel dinivîse kû kîjan vaxslêdanê dibê wekî **vaxslêdana standerd** bîn dîtin.

Li kêleka wê jî vaxslêdanên bi pişeyan ve girêdayî, **vaxslêdana bi sedemî** û **vaxslêdana gerê** têne şirovekirin û pêşniyarkirin.

Ev tavsiye digel sedemên pêşniyaran li ser malperên – Internête ya ya peymangeha – Robert Koch (www.rki.de) têne dîtin.

Pêşniyarên STIKO ji bo **xêzên vaxslêdana parastinê** ya komîteya hevpişk ya yekîtiyê (GBA) ya doktoran, doktorên diranan, doktorên psikoterapî, nexweşxaneyan û sigortayên nexweşiyê li Elmaniya bûne bingeh.

Xêzên vaxslêdana parastinê hemî sigortayên fermî mecbûr dihêle kû wan xizmetên vaxslêdanê wekî yên fermî qebul bikin.

Ew jibo kesên sigortekirî bêpere ye. Vaxslêdanên geştan (ji bilî vaxslêdana li dijî feleca zarokan) û vaxslêdanên xwediyê pişeyan mecbûr in li xwe bixin (ev xwediyê karî bi xwe digire) nemcbûre ku sigorta bihayê wê bide. Xêzên vaxslêdana parastinê dikare, ku jibîr bibe an jî vaxslêdana rotinî rojekê berya rojbûna 18 saliyê bêne lêdan û sigorta wê pêre wê bide.

Salnameya Vaksîlêdanê ya 2017an, ya -STIKO

Salnameya vaksîlêdanê çi ye?

Lîsteya vaksîlêdanên rotîn di salnameya vaksîlêdanê ya STIKO, ya ku jibo temenên destnîşankirî dê pêşniyar bibin, rêzkirî ye. Hevceye kû Vaksîlêdan gor imkanaan di demên zû de, pêk bînin.



Salnameya Vaksîlêdanê ya 2017an, ya -STIKO

(li tenîştê wê binêre Şikil. 8, Rûpel 13)

Pêşniyarên ji bo temenên vaksîlêdanê, bi heftî, mehan û salan tête danê. Bo nimûne: vaksîlêdana di temenê ji 9–14 salî: wate, ji 9. Rojî heyanî 15. jidayikbûnê.

Şirowekirin

G	Vaksîlêdana bingeşin
A	Vaksîlêdana nujenkirî
S	Vaksîlêdana standerd (Rotîn)
N	Vaksîlêdana kû paşê hat dayîn (Derengdayîn)
a	Zarokên berwext jidayik dibin curi,eyek zêdetir di heyva 3an de werdigirin, wate dibin 4 curi,e.
b	Eger vaksîlêdana 1em di temenê 6 heftiyan de, bête pêkanîn, her yek li gorana dermanê bikarhatî ew 2 an.3 qotî ku bikêmanî 4 heftî di navberê de hebin, pêdivî ye.
c	Di dema dana dermanê vaksîlêdanê de, dibe ev curi,e nema bête danê
d	Vaksînlêdana standerd ya keçikan di temenê 9–14 salî de bi 2 qotiyên û navberekê ji 5 mihan de, li nik yê vaksînlêdanê vegeşîne, ji temenê 14 salî ve an bi navberekê ji < 5 mihan di navbera 1. û 2. qotiyên de ye. qotiya 3 têtê xwestin (ji kerema xwe pêzanînin pîspori werbigirin).
e	Nûkirina-Td (Td = Tetanos û difterî) her 10 salan. Vaksînlêdana-T din ya dereng carekê mîna bihevrevaksînlêdana-Tdap (Tdap = Tetanus, Diphtherie û kuxuka ewayê = Pertussis), an. Li dema delîlekî mîna bihevrevaksînlêdan- dap-IPV (IPV = feleca zarokan Poliomyelitis).
f	Carekê vaksînlêdan bi dermanê vaksînlêdanê- MMR (MMR = Sorik, Beqik und kelmêşa elmanî) ji bo mirovên di pey Sala 1970 de ji dayik bûbîn re ≥ 18 salî bêyî vaksînlêdanê diyar Bê vaksînlêdan an ji vaksînlêdanê di dema zaroktiyê de.
g	Vaksînlêdana bi 23-dermanê- ciyawaz-yê iltîhaba fişikê“Polysaccharid”.

Vaksîdanan	Temenê bi heftiyan		Temen bi heyvan					Temen bi salan					ji 60 û bi jor de	ji 18 û bi jor de	ji 60 û bi jor de
	6	2	3	4	11-14	15-23	2-4	5-6	9-14	15-17					
Tetanus		G1	G2	G3	G4	N	N	A1	A2	A (belkî N) ^e					
Difteriya, xenaq		G1	G2	G3	G4	N	N	A1	A2	A (belkî N) ^e					
Xendikok		G1	G2	G3	G4	N	N	A1	A2	A (belkî N) ^e					
Influenza Hemofiliyos tipa b (Hib), Arsimazarokan		G1	G2 ^c	G3	G4	N	N								
Feleca Zarokan (Poliomyelitis)		G1	G2 ^c	G3	G4	N	N	N	A1	belkî N					
Hepatitis B		G1	G2 ^c	G3	G4	N		N							
Pneumokokken ^a		G1		G2	G3	N						S9			
Virusên rota	G1 ^b	G2	(G3)												
Meningokokken					G1 (ji 12 heyvan û bi jor de)		N								
Sorik, Berguh, Mirkutik					G1	G2	N		S ^f						
Xuraya avî					G1	G2	N								
Arsim, Grip											S (Vaksîdanan salane)				
Human Papiloma Virus (HPV)							G1 ^d	G2 ^d	N ^d						

(Şikil. 8: Serrastkirina li gora STIKO-Salname 2017.)

Ji bo risk û Komplikasyonen vaxslêdanê

Kî biryar ji bo rêdayîna dermanê vaxslêdanê dide û kî çavdêriyê dike?

Kî bixwaze agahiya li ser babeta vaxslêdanê webigire, zû nas dike, ku pircaran agahiyên dijber û gelek caran ji yê şaş hene. Bawerbûna çavkaniyan ji bo kesên ne pisporin ne hesane. Ew gelek agahiyên li biwarê vaxslêdanê de carnar dibin sedema nebawerî û sedema nelêdana vaksê.

Ya berçav ew e, ku dermanê vaxslêdanê tenê wê li Elmaniya destûrdarî be, dema bête çesipandin, ku bi rêjeyeke bilind ewlekarî û kartêkiriyekê nişan bide. Divê firmen (karxaneyên) dermana ger bi lêkolînan kû têda hezarên mirovan beşdar bûne, bîn tenahîkirin û îspatîkirinê.

Karmendê niştîmanî û navnetewî vê çavdêriyê bi rê ve dibin. Li Elmaniya peymangeha welatî Paul-Ehrlich-Institut (PEI) wek karmendên berpirsiyar jibo destûrdanê û çavdêriya dermanên vaxslêdnê berpirsiyar in. Ji derveyî ê tenê destûr di rêka Komîsyona- YE li ser asteya Europayê (EMA) dikare bête dan.

Bi alîkariya lêkolînan tenahiyê dikarin gelek, eger ne hemî ji bandûren nexastin peyda dibin, berya destûrdanê binivîsin. Zêdebarî wê ji, her pileke dermanê vaxslêdanê derkeve, hevceye kû ji armendê welatî bîne destûrdan.

Çi bandûren nexastin di ber re yê vaxslêdanê hene?

Wek berê şirove bûbû, ku parçeyek mezin ji dermanê vaksê ji mîkrobên qelsbûyî an ji yê mirî pêk têt. Hinek çalakî dihingivin hev, dema mîkrob digihe laş piştî vaxslêdanê iltîhabeke ku tê xwestin û reaksiyoneke gelekî normal peyda dibe.

Pêvegirêdayî bi vaxslêdanê ve, êş û azarên nezirardar peyda dibin.

Caran cihê vaxslêdanê sor an ji iltîhab pêre çêdibe. Li ba hinekan azariya rehan ji li cihê ku derzî lêketî çêdibe. Li wir perça girêkên lemf de, ta, serîêşan, dilhevketin, westandin çavlixew peyda dibû.

Dermanê vaxslêdanê yê ji virusên

Zindî tîn avakirin dikarin di %5 mirovanda bibe sedame nexwesiya vaxslêdanê. Ew nexwesiya kopya nexwesiya raste lê yekî siste û ne zirardare û ji bo parastina bedenê mirove.

Bigiştî ev bandûren nexastin di pey vaxslêdanê de peyda dibin hêsan in û di hundur 3 roj heta bi heftiyekê de wenda dibin. Tenê kêmcaran bandûren nexastin demeke dirêjtir berdewam dikin û wek **komplikasyonen (aloziyên vaxslêdanê)** têne destnîşankirin. Aloziyên (komplikasyonen) vaxslêdanê ger bîne qeydkirin. Doktor divê agahiyên li ser wan aloziyan nivîsgeha tendurustiyê bişînin.

02.10.2012an ve, nexweş dikarin û pêdiviyê ji, li ser kartêkirin (Tasîr) ji encamên

vekslêdanê peyda bibin, nojdar, dermander an jî karmendên dermana agahdar bikin. Li ser vê <http://verbraucher-uaw.pei.de/ku> ji bo encamdana tiştên neçavkirî wek vekartêkirina vaxslêdanê hatiye.

Di pergala gelekî kêr de reaksiyonên nayên tehemulkirin diyar dibin. Doktor ger diyar bikin kû gelo hin **alerji** li dijî hinek xamên dermanê vaxslêdanê hene an na. Doktor ger him li ser başiyan, imkanên metirsiyanê û serpêhatiyên wê digel vaxslêdana plankirî, berya derzîlêdanê bi nexweş ra biaxe. Hun dikarin pirsên mayî dokorê xwe re bi wi awayî zelalbikin.

Encama vaxslêdanê eger ziyamend be çi bibe?

Têgeha **ziyana vaxslêdanê** di guftûgoyên çapemeniyê de gelek caran bi şaşî wekî bandûren nexastin tên nasdan. Le na be kû mirov ji bandûren nexastin yê demî, cewa me jorê jî şirovekir, ziyana vaxslêdanê fambike.

Mirov tenê dikare li ser ziyana vaxslêdanê, biaxe, eger dema encama vaxslêdanê ziyaneke tendurustî bime an jî ziyaneke aborî derkevin û diyar bibe ku birastî vaxslêdanê bûye sedema wan ziyanan.

Eger **pêşniyarkirina vaxslêdanê** ya geleri bibe sedema ziyane, wê çaxê mafê zerarmend heye kû dewlet hemu xizmeta wi mirovî bedê ser xwe. Lê hevceyê bê gotin kû ziyana vaxslêdanê gelekî kêr. Dibe ku ew pergala ji nav yek milyan




vaxslêdanê peyda bibe. Metirsi qasî yekî, ku brûsk lê bixwe mezine.

Wateya civakî ya Vaksîlêdanê


Li Elemaniya dirêjîya temenê mirovan di 100 salên dawî de ji 40 salî hatiye hildan û xwe ducarî zêde kiriye. Sê sedemên giring ji bo wê bûyerê tîn naskirin: paqîjîya ava vexwarinê, başbûna rewşa hijyenî û vaksîlêdan. Başkirina xizmeta tendurustî beramber wan tiştên din roleke biçûk dilîze.

Bandûren pozîtîv (erênî) yê vaksîlêdanê rêxistî baş berçav in. Di wêneyê Şikil. 9 de kartêkirin di nimûneya xuriyê û Feleca zarokan gelek diyar dibe.

Xwuri



Feleca Zarokan (Poliomyelitis, „Polio“)



Şikil. 9: Bandûrên vaksîlêdanê. Li ser nimûneya xuriya û feleca zarokan (Poliomyelitis) mirov dikare karê mezin yê kû vaksîlêdanê li ser hijmara pergala bibîne. Vaksîlêdana biserketî ta niha ya li dijî xurî ye. Spasî bo rêxistina navnetewî ya tendurustiyê (WHO) di sala 1980î de ya karkir bo nemana nexweşîya xurî li cîhanê.

Pirsê praktîk yên li ser vaxslêdanê

Bi vaxslêdanê re pir caran pirsiyar derdikevin. Em dixwazin li vir, li ser çend pirsan rawestin. Bêgirêdayîya wê bûyerê, hûn dikarin ji bo her pirsgirêkek bi sedema vaxslêdanê derkeve û ji bo riskên metirsîyanê pirsê ji doktorê xwe biken.

Doktor mecbûre, ku berîya vaxslêdanê şîretan li te bike û hertiştî bine ser zimanu te agahdar bike. Hûn dikarin wan derfetan ji bo xwe bikar binin!

Kijan doktor vaxslêdanê dike?

Bigiştî her doktorek mafê wî heye vaxslêdanê bike. Lê ne her doktor dikare pere vaxslêdanê ji sîgorta nexweşiyê bigire. Lê mafên doktorên zarokan û yên malan û her usa jî . doktorê jinan mafê wan ji bo vaxslêdanê Heye.

Ez mecbûrim xwe ji bo vaxslêdanê amade bikim?

Jo bo vaxslêdanê amedakirînekî taybet ne hevceye. Le hun ger **nasnama xwe ya vaxslêdanê (pirtûka vaxslêdanê)** tev xwe binin. Her usa jî eger hûn cûn doktorekî nû hûn nasnama xwe ya vaxslêdanê li tev xwe bibin. Eger we nasnama xwe ya vaxslêdanê wendakirîye an jî eger ya we qet nîne, doktorê we dikare yekî nû ji bo wê amade bike. Zarokên ji 16 salî civantirin, dibê dê û bavên wan destura xwe bidin. Eger pirsên we ji ser vaxslêdanê heye wana binivîsinin û ji doktorên xwe bipirsin.

Buhayê Vaxslêdanê çi qase?

Hemî vaxslêdanên ku ji hêla STIKO ve hatibûn pêşniyarkirin ji bo kesên sîgortekirî **bêpere ne**. Her wesa ji dermanê vaxslêdanê **bêpere ne**.

Vaxslêdana ku bo pişeyî pêdivî be, pêdivî ye xudanê karî bide. Sîgorte nemecbûr e buahyê vaxsên seferan – Jîbilî (xêrjî) vaxsa diji feleca zarokan) bide. Lê dîsan jî gelek ji van sîgorteyên serbixwe perên vaxsên ji bo seferan tîn pêşneyarkirin didin, Virûsa HPV ji bo yên di ser 18salî re an jî parastina ji arsimê(persivê, girîpê) ji bo mirovên di bin 60 salî re hemî an jî parekî didin. Li destpêkê pirsê ji sîgorta xwe an jî doktorên xwe bikin.

Kengî vaxslêdan dibe û kengî nabe?

Tenê sedemên kêma yên tibbîye hene kû vaxslêdanên pêşniyarkirî neyêne ledan an jî dereng bîna lêdan. Dû sedemen herî giring nexweşiyêke infeksiyonî û alerjî diji parçeyekî ji dermanê vaxslêdanê. Nexweşiyêke infeksiyonî ligel pêketina bi germê heta 38,5 °C – ku ba zarokên biçûk pîrr caran tîna ditin –ne sedem ji bo nedana vaxslêdanê ye.

Mixabin gelek caran jî mirovên bi nexweşiyên **kevnar** (chronik) wek nexweşiyê şekir (Diabetes), asthma û nexweşiyê dilgera xwînê nikarin vaxs lê xwe bidin, ji tîrsa, ku ziyar li wan bibe.

Lê di alê din da mirovên bi nexweşiyên kevnar dikarin zêdetir ji vaxslêdanê feyda bikin, ji ber ku sîstema parastinê ya bedena wan ji ya bedenên mirovên bi tendrustî bêhêztir û dikarin bi hesan bi nexweşiyên infeksiyonî bikevin. Hûn dikarin doktorên xwe ji bo informasyon bipirsin.

Li dijî çi nexweşiyên dibê mirov vaxslêdan bibe?

Berê xwe bide pêşniyarên STIKO (li slanameya vaxslêdanê binêre, şikil. 8). Eger vaxsledanên ku tên pêsneyarkirin l igel zarokan an jî civanan bi tevayî an jî tenê parçeyek hatine lêdan, dive ev hemî beriya 18 saliyê ger werin ledan. Ji ber ku lêdana wan vaxslêdanên beriya gêhistina 18 salî erkeka fermî ya sîgorta ye û **bêpere ye**. Salnameya vaxslêdanê tenê vaxslêdana stander diyar dike. Li gora şert sedem û mercên jiyanê vaxslêdanên din yê bi fêde ji hene (**nişanên Vaxslêdanê**). Gelek sîgorta bûhaya wan vaxslêdanan, her wesa vaxsledanên ji bo seferiyê, hemî an jî hinek digrin ser xwe. Ji bo ne zanîyan ne hesene ku hemî vaxslêdanên pêşniyakirî bişopênin. Jiber wê yêkê, em şîretê li te dikin, di demên tevdirkirî de- ya baş salê carekê bi doktorên xwe re li ser vaxslêdanê bi axifin û deftera vaxsledanê binêrin.

Berya seferêkî dûr ya plankirî bi kêmasî bi 6 heftiyên agahiyên pêdivî li ser vaxslêdanan ji bo geştan werbigirin.

Çi pêdivî ji bo jinên ku yê zarokan dixwazin, yê ducanî û şîrdayê bêne berçavkirin?

Hemî jin yê di temenê dikare zarok ji wan re çêbibin, bitaybetî ew jinên bi daxwazên zarok destnîşankirîne, divê bilez rewsa xwe ya vaxsledanê diji mirkutik û xurya avê bidin berçav. Ev mîkrob dikare zaroka çênebûyî re seqetiyê peyda bike û bibe sedema mirinê. Ya giring jî parastina wana ji xendikoke ye.

Ji bo parastina zarok dibê di dema ducaniyê tenê vaxslêdana pêdivî were lêxistin. Vaxslêdan li dijî Arsimê jibo jinên bi ducanî tê pêşniyakirin.

Jibo jinên ducanî yê vaxslêdana parastina wan kêr e, divê mirovên derdorên wan derziyên vaxslêdanê li xwe bidin. Bi wî awayî jina ducanî zarok tene parastin ku bi nexweşiyên nekevin. Careke din: eger defret hebe, dibe vaxslêdan ya endamên malbatê jî berya ducaniyê li gor zagonên listeya vaxslêdanê-STIKO (Şikil. 8) temam bibe. Jinên zarokan şîr didin, dikarin hemî vaxslêdanên pêdivî werbigirin ji bilî ya li dijî taya zer.

Divê ez çi serederiyê piştî vaxslêdanê bikim?

Piştî vaxslêdanekê pêdivî nîne serederiyên tabet bêne bicihanîn. Hinek sistbûn an jî tayek dikare peyda bibe, ku tu sê rojan li ser hev bêtaqet bimînî. Ji ber wê jî piştî vaxslêdanê dibê karên sportik yê giran ku mirov gelekî biwestîne neyên kirin. Ku gerim hebe hevceye keu dermanên ku dikarin germê.

Çi ne vaxslêdanên bo geştan yê pêdivî min in?

Li ser malpera navenda jibo tibba geştê (<http://www.crm.de> an jî <http://www.impfkontrolle.de>), civaka Elmanî ji bo tibba tropic (<http://dtg.org>) û peymangeha Bernhard-Nocht (<http://www.gesundes-reisen.de>). Ew agahiyê tendurustiyê li ser gelek welatan, digel yên ku vaxslêdan pêşniyar kirî. Hevceye kû hûn xwe li ser van herdû xalên seferî yên jêr agahdar bikin.

Hevceye ku hûn demekî zû da dest pê bikin

Ji bo parastina mirov ji bo gelek vaxslêdan bi kêmanî 6 heta 8 heftiyan dem hevceye. Eger berya seferê bi demeke kurt da vaxslêdana li dijî taya zer (Ochropyra)- an jî iltîhaba çermê mêjû (Meningitis) hatiye lêdan, li hinek welatên kû serfer bo wan dibe, nayên qebûllîkirin û dibe ku hûn di sindorda werin vegerandin û nehêlin derbazî wî welatî bibin. (Tab.1)!

Rewşa peredanê zelal bikin

Xêrjî vaxslêdana li dijî feleca zarokan (Polio) sîgorta ne mecbûre misrefên vaxslêdanên seferê bide ser xwe. Ji ber wê yekê ger hûn di demeke guncayî de, vê pirsê bi sîgorta xwe re çareser bikin.

Vaxslêdan dijî	Dema dawî ji bo vaxslêdanê	Ta kengî vaxslêdan diçe	Têbînî
Taya zer (Ochropyra)	10 roj berya Geştê	Dirêjahiya jiyanê*	Vaxslêdan tenê di cihê tabet ji bo vaxslêdana taya zer
Iltîhaba çermê mêjû (Meningitis)	10 roj berya Geştê	3 sal piştî Vaxslêdanê	Piranî Kombinasîyona dermanê vaxslêdanê li dijî tîpa A, C, W135 û Y

Tab. 1: Agahî bo nivîsîna vaxslêdana geştê li dijî taya zer û iltîba tevna mejî. Hinek welat hene ku bo seferê daxwaza belegeyê bo vaxslêdana li dijî nexweşiyên taya zer û/an iltîhaba çermê mêjû (Meningitis) (sertefîka vaxslêdanê ya internasyonal di deftera vaxslêdanê de). Hin welat daxwaza hin vaxslêdanên din dikin (bo nimûne vaxslêdana Arsimê). Di dema guncayî de agahiyan werbigire.

* Hinek welat hene, daxwaza hin belgeyên zêdetir ji geştîyarên tene welatê wan dikin, mîna belgeya Germahiya zer- Dubarevaxslêdan, eger ew belegeya vaxslêdan germahiya zer kevtir ji 10 salan be. Ji ber wê jî, dema hun bixwazin geşteke bikin, li şert û mercên wan welatan haydar bin.

Nexweşiyên gering yê bi sedema vakslêdanê pê nayên ketin

Difteriya, xenaq

Mîkrob	<i>Corynebacterium diphtheriae</i>
Rêkên guhestinê	Infeksiyona dilopî an ji kontkaxa bedenê
Nîşanên nexweşiyê	Ta, westandin, qirikêş û perç, xwîziyeke spî di gewriyê de, zoriya helm- û daqulandinê
Komplikasyon	Xetimandina rêya helmê, ziyana masulka dil, ziyana li gurçilan û kezebê, nîşanên felecbûnê

Haemophilus influenza tîpa b (Hib), Arsima zarokan

Mîkrob	<i>Haemophilus influenza</i> tîpa b
Rêkên guhestinê	Infeksiyona dilopî
Nîşanên nexweşiyê	Ta
Komplikasyon	Iltîhaba çermê mêjî ya bi nê, kramp (qerimbûn) û telefê mejî û iltîhaba hestiyê qirikê digel tengahî di hilmgirtinê pergala fetisînê, jehra xwînê, iltîhaba pişikê

Hepatitis B (zerik)

Mîkrob	Virusa Hepatitis B
Rêkên guhestinê	Tikiliya cinsî (li Elmaniya dor 2/3 ji rewşan e), xwîn, jidayîkbûn (li nik vegirtina= „Infeksiyon“ dayîkan)
Nîşanên nexweşiyê	Sêweyê diyarbûna A nîşanan(dor 2/3 ji rewşan e) Şêweyê diyarbûna nîşanan (dor. 1/3 ji rewşan e): di nav de jî zerbûna çerim, mezinbûna kezebê, tarîbûna mîzê, Rengdan di destava mezin de, nîşanên nezela yê şewbê (persîv)
Komplikasyon	Kevnاربûna pêvajoyê, ya bihevkişandina kezebê (Zirrrose) û /an dikare bibe sedema penceşêra kezebê



Eger tu bixwazî agahiyên zêdetir li ser mifayên vakslêdanan bizanibî, em pêşniyar dikin tu ji online ya xaça kesk ya elmanî li ser mîkrobên infeksiyonî ji A heta Z” ji pêşî heta bi dawiyê” derbixî. Ji bilî wê doktorê te di rêya wêneyê nexweşiyê re, erênî û metirsiyanên vakslêdanê û pêşniyarên-STIKO te agahdar bike û digel te li dor serederiya wan biaxive. **Şîret û agahiyên bo xwe werbigire!**

Human Papiloma Virus (HPV)

Mîkrob	Gelek rengên Virusa Human Papiloma Virus
Rêkên guhestinê	Infeksiyon bi kontakta çerm û bi rêya kontakta seksê
Nîşanên nexweşiyê	Guherînen nexweşiyê di serê malzarokê de, an li quz, di hundurê quzî de û li hêla qûnê, ew yê zêde êş nînin an nabin sedemên çêbûna çu astengiyên din. Ew nîşan wê demê peyda dibin, dema peçeşêr belav bûbe û gihabe asteyeke mezin.
Komplikasyon	
Jin	Penceşêra (qansera) qirika malzarokê, penceşêra vajina
Mer	Penceşêra penis
Herdu cinsiyet	Penceşêra anus, behluliken genital, penceşeren herema ru u qirik

Arsim (Influenza)

Mîkrob	Virusa influenza
Rêkên guhestinê	Infeksiyona dilopî
Nîşanên nexweşiyê	Germa bilind ji nişka ve, êşa serî- gewrî-reh-û Azarên mofîrkê, kuxuk, bronşît
Komplikasyon	Îltîhaba pişikê, îltîhaba rehên dilî, îltîhaba berîkên defnê „bêvilê“, îltîhaba damarên sistemê, xerbatirbûn nexweşiyên kevnar yên heyî

Xendikok (Pertussis)

Mîkrob	Bakterium <i>Bordetella pertussis</i>
Rêkên guhestinê	Infeksiyona dilopî
Nîşanên nexweşiyê	Bi zêdeyî heftiyar berdewam dike, êrîşên kuxukê, hilmkêşana bizorê, verîşandin, pergalên xeniqandinê (li ba derguşan „kuxuka bêdeng“)
Komplikasyon	Îltîhaba guhê navê, îltîhaba pişikê, pergalên qerimibûnê, xwînherikîn, bitaybet li ba zarokên şîr: telef di mejî de dimîne, bêhîncikandin

Feleca Zarokan (Poliomyelitis, „Polio“)

Mîkrob	Virusa Polio
Rêkên guhestinê	Infeksiyona lepax
Nîşanên nexweşiyê	Zêdetir bê nîşan. Di durvên hêsan: nîşanên bêteybet digel ta, qirikêş, rehêş, û serêş. Di pergalên zor de: reqbûna sermilan û pişt histû û pişt
Komplikasyon	Felec li herdû dest, lîngan, reya bêhîndan, feleca rûvî û kîsika mîzê

Sorik

Mîkrob	Virusa Sorikê
Rêkên guhestinê	Infeksiyona dilopî
Nîşanên nexweşiyê	Ta, harsim, iltîhaba çav, iltîhab di dev, qirik û gewriyê, pizikên sor li ser hemî beden, carnana zikêş û zikçuyîn
Komplikasyon	Iltîhaba guhê navî û pişikê, iltîhaba mejî, telefeke mezin ya xerakirina mejî (SSPE), şûnbirîna bibikên çav

Nexweşiya Meningokokken (iltîhaba çermê mejî)

Mîkrob	Bakterien tipa <i>Neisseria meningitis</i>
Rêkên guhestinê	Infeksiyona dilopî
Nîşanên nexweşiyê	Derbasbûna hêsan: iltîhaba rêya hilmgirtinê, sorbuna çerim
Komplikasyon	Germa bilind, şok, iltîhaba çermê mejî (Meningitis), jehra xwînê, koma

Berguh

Mîkrob	Virusa berguhê
Rêkên guhestinê	Infeksiyona dilopî
Nîşanên nexweşiyê	Serêşî, iltîhaba tospiya (gîrêka) guh tûkê, ta
Komplikasyon	Iltîhaba mejî û çermê mejî, kerrbûna bi berdewamî, iltîhaba hêlikan û sterizasyon

Infeksiyona Pneumokokan

Mîkrob	Bakterien <i>Stratococcus pneumoniae</i>
Rêkên guhestinê	Infeksiyona dilopî
Nîşanên nexweşiyê	Ta, kuxuk, iltîhaba guhê navê
Komplikasyon	Iltîhaba kezebê, iltîhaba çermê mêjî, jehra xwînê

Nexweşiya Rotavirus

Mîkrob	Rotavirus
Rêkên guhestinê	Infeksiyona lepax
Nîşanên nexweşiyê	Gelekcaran destpêkirina xafilî: zikçûyîn û verîşandin, ta
Komplikasyon	Zikçûyîna giran û verîşandin li ba zarokan; Eger neyê dermankirin, bi sedema wendakirina avê, dikare zortir derbas bibe

Mirkutik (Xurîya elmanî)

Mîkrob	Virusê mirkutikê
Rêkên guhestinê	Infeksiyona dilopî û li ser reya xwinê li ba ducaniyan
Nîşanên nexweşiyê	Gelek caran bînîşan (lê disan jî ew dikare jo bo mirovên din –ducani- yên ku nehatine vaksledan bibe sedama infeksiyon); rewşa derbazbûna nexweşiyê: ta, nîşanên mîna yên arsimê, pizikên sorên yên çerm
Komplikasyon	Seqetmayîna zarokan-Fetus (eger dayik di dema ducaniyê de infeksiyona çav, guh, dil û mejî nexweş ketiye), zayîna berya dema xwe, iltîhaba movikan, mejî- an jî kezebê

Xurya avî (varizellen)

Mîkrob	Varicella Zoster Virus, ew mîkrob dibe sedema xurya avî (Nexweşiya yekem), paşê qarîşa buharê (pelqaz)
Rêkên guhestinê	Infeksiyona dilopî û li ser reya xwinê li ba ducaniyan û kontak
Nîşanên nexweşiyê	Ta, serêş, êşa qor û pîlan, dilhevketî, sorbûna çerm ya kû dixûrî
Komplikasyon	Ilîthaba çerm paşê xûrandinê ilîthaba pişikê,ilîthabên mêjî û çermên mêjî, Seqetmayîna zarokan-Fetus (eger dayik di dema ducaniyê û dema zarokbûnê de infeksiyona çav, guh, dil û mejî nexweş ketiye

Tetanus

Mîkrob	Bakteria <i>clostridium tetani</i>
Rêkên guhestinê	Infeksiyona bi ser rêya birînan (her usa ji birînen herî piçuk)
Nîşanên nexweşiyê	Krampa masulkên cûtinê û yên rû. Paşê dikaren masulkên hmeu beden bi kramp bikevin.
Komplikasyon	Ilîthaba pişikê, feleca rehên bêhngirtinê, şikestina hestî, lerza dil, nelênexandina dil.

Têgehên pispor yên herî giring

Alerjî

Reaksiyona kû li dijî derman an ji tiştên din nayê tehmulkirin. Reaksiyonên beden dikarin pirr cudayî xwe pêşkeş bikin. Li kêleka reaksiyona çerim di rewşeke dijiwar bi şoka alerjî û metirsiya jiyan peyda bibe.

Antikor

Antikor ew dermanên kû bedena mirova piştî kontakê bi mîkrobekî nexweşiyê re an piştî vaxslêdanekê li dijî wan mîkroban ava dike.

Asêkirina bingeîn

Bi dayîna dermanê vaxslêdanê gelek caran di demên cuda de bingeha parastinê li dijî nexweşiyekê tê avakirin.

Bakterî

Yekşan organê mîkro bê dendika şanê, lê bi metabolizma xwe ya serbixe. Xwezêdekirin li ser reya parçebûna şaneyan pêk tê.

Dermanê vaxslêdana zindî

Dermanên vaxslêdan yên ji vîrus ên sistin lê disa jî dikarin hejmara xwe zêdebikin dibin sedema infeksiyonên rastî (lê nezirarmend in). Bi ser wî awayî dikare bedena mirovan dijî wan mîkroban hesgir kirin û di pêserojêda bê parastin.

Komplikasyonên Vaksledanê

Wekî komplikasyon tenê reaksiyona vaxslêdan di ser rêya normal tîn destnîşankirin. Reaksiyonên normal yên wekî sorbûn ji bo demekî kin, peydabûna perç an jî azar li derdora cihê derzî lê hatî Dan, bilindbûna germê zêteyî 39,5 °C û her usa jî perçbûna girêkên limfê ne. Hemu komplikasyon ger cihê pêwendîdara werin destnîşankirin.

Kronîk (Kevnar)

Tiştên kû hêdî hêdî pêk tînin, demekî dirêj da berdewamen.

Mêvandar

Di biolojiyê de mêvandar bûnewerek e, ku ji bilî xwe organizmên din ji li ser bedena xweda xwedî dike.

Nasnameya/Pirtûka vaxslêdanê/ Pasaporta vaxslêdanê

Di vê pirtukêda de hemî vaxslêdanên bi kar hatine tê de tomarkirî ne. Geringe kû ew nasname hertim doktora bê nişan kirin.

Nexweşiya infeksiyonî

Nexweşî ya kû di rêya mîkrobeke tê veguhestin.

Nûjenkirina Vaksîlêdanê

Armanca nûjenkirina vaksîlêdanan ewe kû di demên bitevdîr dawî vaksîledana bîngehî sîstema parastina Nujên bike û bi wî awayî hêjmara antîkora zêdebike.

Parazît

Parazît bûnewerên zîndî ne, yê kû xwarina xwe li ser hesabê bûnewerên din distînin. Ev wek bûnewerê Mêvandar tê hesêbê lê zîyanê digihîne. Parazît yan mêvandarê xwe qet nakuje an jî piştî demeke dirêj dikuje. Wek nimûne kurmên zirav û virus bûnewerên parazîtî.

Pêşniyara vaksîlêdana ji bo raya giştî

Ji bo parastina tendurustiya geleri dibê kataolgek li ser bîngeha pêşniyarên-STIKO ya rojevê ji bo raya giştî bîn amadekirin. Her karmendekî tendurustiya welayetê ji bo welayeta xwe wê kataloga li ser vaksîlêdanê amade û belavbike. Eger di vê çarçewê de encama vaksîlêdanê zirar çêbû, mafê yekî heye daxwaze bike kû ew zirara wî ji alê dewletê bê hildan.

Rêzname vaksîlêdana parastinê

Ev rêzname vaksîlêdana parastinê (SI-RL) dibêj kû kîjan xizmeta vaksîlêdanan sîgortê nexwesiye dibê bidin ser xwe. Ew li ser pêşniyarên-STIKO hatiye amadekirin û ji komîta derve ya parastinê (G-BA) jî tîn belavkirin.

Salnameya vaksîlêdanê

Salnameya vaksîlêdanê ya STIKO hemî vaksîlêdanên stander li pey xwe rêz dike (Şikil. 8). ew diyar dike, ka mirovekî kîjan vaksîlêdan di kîjan temenî de li xwe bide.

STIKO

STIKO komîsiyone kû ji grûpeke pisporên serbixwe haitye amadekirinê û li peymangeha fermî ya Robert Koch-Institut (RKI) li Berlinê pêşniyaran ji bo vaksîlêdanê dike.

Şanên bergiriyê (parastinê)

Ji bo berxwedana bergiriyê gelek tîpên şanan hene û xebata wana di navbera xweda gelek tevliheve. Ew şanana wekî şanên bergiriyê tîn binavkirin.

Vaksîlêdana rotînî

Ji STIKO jibo hemwelatîyên giştî bêtî kû temen li ber çav bête danî vaksîlêdan pêşniyar dibe. Bi giştî erkê Xizmetê yê sîgorteyê fermî û pêre ji yê sîgortekirî ye bêpere ye.

Vaksîlêdanê sedemî

Li ser bîngeha taybetiya jiyanê- an rewşa tendurustiyê pêşniyar dibe kû bêhtir ji vaksîlêdana rotînî hin vaksîledanên din bîn lêxistin.

Vakslêdana seferê

Xêrjî vaksledanên kû li Elmaniya rotînî têne kîrin, ji gor nexweşiyên kû di welatê kû sefer dîkin ji bo parastinê tîn pêşniyarkirin. Li hindekan welatan berîya seferê belge nameya vaksledanên taybet têne xwestin (taya zer, Meningokokken „iltîhaba sehaya“).


Virûs

Virûs jî **parazîtî** û di nav şanên bûneweran de dijîn. Ew di hundurê xwe de „programê“ xwe bo zêdebûn û belavkirin hildigire, lê nikare xwe xwedibike û ji ber wê yêkê jî bîngeha jiyana xwe ji yê şanên **Mêvandar** digre.

Ziyana ji vaksledanê

Reaksiyona vaksledanê ya di ser rêya normal re, ya dibe sedema zîyanên tendurdustiyê an jî zîyanên aboriyê li ba yê vaks li xwe dayî an jî bibe sedema zîyana yêkî dinê.

Her usa ji misrefa qezayên kû di li ser rêya çûyina vaksledanê çêdibin li gor rêzname sîgortayê li alê sigortêda tîn girtin û ew bûyera li gor rêzname wekî zîyana vaksledanê tîn qebûlîkin.



Adrêsen giring yê pisoriyên wî biwarî

Bundeszentrale für gesundheitliche Aufklärung (BZgA)

Ostmerheimer Str. 220 | 51109 Köln
Tel.: 0221 89920 | Fax: 0221 8992300
E-Mail: poststelle@bzga.de (jibo pirs, bersiv)
E-Mail: order@bzga.de (jibo daxwazkirina Mediya û metriyalkarraban)
<http://www.bzga.de>

Navenda elmaniya bo rewşenbîrkirina tendurustiyê (BZgA) wek karmendên pisor jibo pêşdebirina stratîjiyên xweparastinê û mukumkirina tendurustiyê, program û projektan çêdikin.

Xalên din yê giring pêşdebirina rêzbingeh û rêpênîşandan naverokê û rêbazên pratîk yê rahênanê, tendurustiyê û hînbûnê di çarçewa perwerdeya tendurustî û- fêrbûnê de, herweha karbirêxistin û bihêzkirina zanebûna tendurustî û perwerdeya tendurustiyê.

Jibo vê meremê desteseriyê li ser kilîlên gelek agahiyên dike, ew e ya tevdira agahiyên pisorî dike û diweşîne, herweha lêkolînên xwe yê zanistî jî diweşnê. Navenda Elmaniya ya fêrbûn û tendurustiyê navendek e ya karmendên pisor e beşek e ji wezareta Elmanî jibo tendurustiyê.

CRM Centrum für Reisemedizin GmbH

Hansaallee 299 | 40549 Düsseldorf
Tel.: 0211 90429-0 | Fax: 0211 90429-99
E-Mail: info@crm.de | <http://www.crm.de>

Navenda nojdariya seferê GmbH peymangehek pisor e, ya ku karê xwe bo başkirina nojdariya şewirmendiyê û hajêkirinê bo seferên welatên derve terxan kiriye. Jibo welê jî agahiyên li ser êşên vegirtinê û- metirsyanên tendurustiyê pêk ve tene nêrîxandin. Navenda nojdariyê ya seferê (CRM) nûçebangeke nojdariya seferê ya têr û tesel çêdike li ser welatên sefer bo wan dibe, ji bo asteya pakijiya wan û nexweşiyên heyî.

Jibilî wê jî listeyekê ji taya zer-cihên vaksêdanê û ji nojdarên rahênekirî di biwarê Nojdariya seferê.

Deutsches Grünes Kreuz e.V. (DGK)

Nikolaistraße 3 | 35037 Marburg
Tel.: 06421 2930 | Fax: 06421 229-10
E-Mail: dgk@kilian.de | <http://dgk.de>

Navenda xaça kesk ya Elmanî (DHK) yek ji kevintirîn rêxistînen di mehkemê de tomarkirî jibo mukumkirina tendurustiyê ye û ragihandinê li Elmaniya. Armanc ew e ku rewşenbîriya tendurustiyê û babetên wê di nav xelkê de bête belavkirin. Ew rêxistin danûstendinê jibo peydakirina portaleke agahiyan dewlemend dike.

Deutsche Gesellschaft für Tropenmedizin und Internationale Gesundheit e.V. (DTG)

c/o Bernhard-Nocht-Institut für Tropenmedizin
Bernhard-Nocht-Str. 74 | 20359 Hamburg
Tel.: 040 42818-478 | Fax: 040 42818-512
www.dtg.org

Civata elmanî jibo nojdariya deverên gerim girêdaneke ji Nojdarên mirovan, nojdarên tebayan û zanistên zaniyariya suruştê, jibo li ser qada nojdariya deverên gerim bikaranîn, lêkolînkirin û şêwirmendkirin. Li vir nojdariya hajêbûna xweparastinê jibo kesên seferê bo deverê gerim û mîna gerim dikin herweha têderxistin û dermankirina nexweşiyên ji wan deveran tîn. Parçeyek ji babetên li ser nojdariya deverên gerim û seferê digihin behsê nişanên vaksîlênê û nexweşiyên vegirtinê bi hûrdeyî dikin. Zêdebarî vê jî lîsteyek bi deverên- vaksîlêdana taya zer in hemî Elmaniya diweşîne. DTG şêwra yekane "Individuell" di pergalên yekane de nade.

Paul-Ehrlich-Institut (PEI)

Bundesinstitut für Impfstoffe und biomedizinische Arzneimittel
Paul-Ehrlich-Straße 51–59 | 63225 Langen
Tel.: 06103 77-0 | Fax: 06103 77-1234
E-Mail: pei@pei.de | <http://www.pei.de>

Peymangeha paul-Ehrlich-Institut/peymangeha elmanî jibo dermanê vaxslêdanê û bionojdariyê çavdêriya tenahî û kartêkirina bionojdarî û derman wek nimûne. Dermanê vaxslêdanê jibo mirov û tebayan an jî dermanê ji xwînê dike.

Parçe zîrek di Paul-Ehrlich-institut gelek cûr e û bi karê destûrwerigirtinê û çavdêriyê jibo dermanê bio“nojdariyê, destûrwerigirtina fehsên nexweşxaneyî an jî nirxbûna kartêkirinên dibê re yên dermanî. Derveyî wê jî li peymangehê li beşên Virologî „Zanista li ser Vîrus, immunologî „zanista li ser berxwedana laş“ lêkolîn li ser şan- û terapiya genikan tbd. dibin.

Reisemedizinisches Zentrum am Bernhard-Nocht-Institut

MD Medicus Reise- und Tropenmedizin GmbH
Bernhard-Nocht-Str. 74 | 20359 Hamburg
Tel.: 0900 1234999 (1.80/Min) | Fax: 040 42818-340
E-Mail: rmz@gesund-es-reisen.de | <http://www.gesund-es-reisen.de>

Navenda nojdariya seferê agahiyên aktuell li ser belavbûna nexweşîyan û wek pêşniyaran ji bo hajêbûna tendurustî di demên seferê de diweşîne.

Agahiyê sereke li dor wan welatên geşt li wan dibin behsê babetên tendurustî yên rojevê mîna pêpelûka pakijkirinê, rewşa jîngehê û metirsiyên vegirtina nexweşîyan. Li kêleka wê jî mirov dikare bi rêya telefûnê jî şêwrê bi wan bike.

Robert Koch-Institut (RKI) / Ständige Impfkommision (STIKO)

Nordufer 20 | 13353 Berlin

Tel.: 030 18754-0 | Fax: 030 18754-2328

<http://www.rki.de>

Peymangeha Robert Koch-Institut (RKI) rêxistina navend e li Elmaniya di biwarê weşandina agahiyê li ser tendurustiyê û berpirsiyar e jibo naskirin, parastin û cenga li dij nexweşîyan.

RKI şêwra karê pisopriya çapemeniyê û berpirsiyariyên wezaretan, bitaybetî wezareta elmaniya bo karûbarê tendurustiyê (BMG) dike.

Li ba vê peymangehê gelek komîsiyonên zanistî bicih bûne, bo nimûne komîsiyona berdewam ya vaxslêdanê (STIKO), ya ku pêşniyaran li ser vaxslêdanê dide.

RKI agahîyan li ser malperên xwe ya bi zimanê elmanî bo babeta vaxslêdana parastinê dide, http://www.rki.de/DE/Content/Infekt/Impfen/impfen_node.html, lê nikare şêwra takekesî di pergalên takekesî de bike. Yê jibo bersivan van hemî pirsan berpirsiya doxtor e.

Adrêsen Internêtê yên bisûd

www.gesundes-kind.de

www.impf-experten.de

www.impfenaktuell.de

www.impfen-info.de

www.kindergesundheit-info.de/themen

www.kinderaerzte-im-netz.de

www.netdoktor.de/Impfungen

www.reisemed-experten.de

Plana vaksîdanê ya min bixwe



Xwendevanên birêz, bi alîkariya „plana kesayeti ya vaksîdanê” hun dikarin pergala vaksîdana xwe ya aktuell û ya endamê malbata xwe diyar bikin. Hun dikarin bînerin, ka çi vaksîdan divêt hun careke din li xwe bidin anjî yê we li xwe nedayî divêt hun li xwe bidin. Em dixwazîn bînin hîzra te, ku di vê pirtûkê de „plana vaksîdanê ya kesayeti” heye ya ku xizmeta bervekirinê dike û **cihîr ji doxtorê malê re nîne** ku vî erkî birê ve bibe û çavdêriya nasnameya vaksîdanê (R. 17/R. 25) diyar bike. Eger hun nêrehet in an jî pîrsên we hebe, berê xwe bidin doxtorê xwe yê malê.

Em pêşniyar dikin, ku hun weha serderiyê bikin dema hun palana kesayeti ya vaksîdanê deynin:

Li R. 13 an ya vê rênasê hun ê salnameya vaksîdanê 2017 ya aktuell STIKO bibînin. Ew rêz dike, ka kîja vaksîdan pêşniyar dibe jîbo malbata te ji nexweşiyên vegirtinê biparêze. Jîbo wê jî agahiyên hûrgilî tê de

hene, kengî ev vaksîdan pêdivî ye pêk bihêt baş e. Li gor wan agahiyên liberdest yê wir mirov dikare vaksîdanekê li pey ya din fehes bike, ka gelo ew pêşniyarên ta îro hîn wilo **bi temamî** li wir in.

Di vê rewşê de, x êkê li vaksîdanê hercar ya qadê (ku li ber te ye) bide. Eger vaksîdan hemî nebûbin, bo nimûne, jiber ku salên berê nehatibû birin, we xwe jibîr kiribû an jî we vaksîdanê dawî li xwe nedabû, x li wir de, „ez ê li xwe bidin û ya ji min çûyî vegerînim”. Ew tişt bo zarok û hevjiya te jî dibe.

Başiyên „plana vaksîdanê ya kesayeti”

- Bi vî rengî mirov agahiyên -pêdivî- nêrînekê li ser rewşa vaksîdanê werdigire.
- Ev dihele ku danûstendin di gel doxtorê malê li ser hûrgiliyan berdewam be.


Plana vaxslêdanê ya min bixwe

Vaxslêdan li dijî	Li pêş	Tiştê li min çûyî dê vegeerênim/ taze bikim
Difteriya, xenaq	☐ Ez ☐ Hevpişk ☐ Zarok 1 ☐ Zarok 2 ☐ Zarok 3 ☐ Zarok 4	☐ Ez ☐ Hevpişk ☐ Zarok 1 ☐ Zarok 2 ☐ Zarok 3 ☐ Zarok 4
<i>Haemophilus influenza</i> tîpa b (Hib)	☐ Ez ☐ Hevpişk ☐ Zarok 1 ☐ Zarok 2 ☐ Zarok 3 ☐ Zarok 4	☐ Ez ☐ Hevpişk ☐ Zarok 1 ☐ Zarok 2 ☐ Zarok 3 ☐ Zarok 4
Virusa Hepatits B	☐ Ez ☐ Hevpişk ☐ Zarok 1 ☐ Zarok 2 ☐ Zarok 3 ☐ Zarok 4	☐ Ez ☐ Hevpişk ☐ Zarok 1 ☐ Zarok 2 ☐ Zarok 3 ☐ Zarok 4
Human Papiloma Virus (HPV)	☐ Ez ☐ Hevpişk ☐ Zarok 1 ☐ Zarok 2 ☐ Zarok 3 ☐ Zarok 4	☐ Ez ☐ Hevpişk ☐ Zarok 1 ☐ Zarok 2 ☐ Zarok 3 ☐ Zarok 4
Influenza (Arsim)	☐ Ez ☐ Hevpişk ☐ Zarok 1 ☐ Zarok 2 ☐ Zarok 3 ☐ Zarok 4	☐ Ez ☐ Hevpişk ☐ Zarok 1 ☐ Zarok 2 ☐ Zarok 3 ☐ Zarok 4
Xendikok (Pertussis)	☐ Ez ☐ Hevpişk ☐ Zarok 1 ☐ Zarok 2 ☐ Zarok 3 ☐ Zarok 4	☐ Ez ☐ Hevpişk ☐ Zarok 1 ☐ Zarok 2 ☐ Zarok 3 ☐ Zarok 4
Feleca Zarokan (Poliomyelitis)	☐ Ez ☐ Hevpişk ☐ Zarok 1 ☐ Zarok 2 ☐ Zarok 3 ☐ Zarok 4	☐ Ez ☐ Hevpişk ☐ Zarok 1 ☐ Zarok 2 ☐ Zarok 3 ☐ Zarok 4
Sorik/Berguh/ Mirkutik	☐ Ez ☐ Hevpişk ☐ Zarok 1 ☐ Zarok 2 ☐ Zarok 3 ☐ Zarok 4	☐ Ez ☐ Hevpişk ☐ Zarok 1 ☐ Zarok 2 ☐ Zarok 3 ☐ Zarok 4
Ilîhaba sehaya (Meinigokokken)	☐ Ez ☐ Hevpişk ☐ Zarok 1 ☐ Zarok 2 ☐ Zarok 3 ☐ Zarok 4	☐ Ez ☐ Hevpişk ☐ Zarok 1 ☐ Zarok 2 ☐ Zarok 3 ☐ Zarok 4
Ilîhaba pişikê (Pneumokokken)	☐ Ez ☐ Hevpişk ☐ Zarok 1 ☐ Zarok 2 ☐ Zarok 3 ☐ Zarok 4	☐ Ez ☐ Hevpişk ☐ Zarok 1 ☐ Zarok 2 ☐ Zarok 3 ☐ Zarok 4
Virusên rota*	☐ Zarok 1 ☐ Zarok 2 ☐ Zarok 3 ☐ Zarok 4	☐ Zarok 1 ☐ Zarok 2 ☐ Zarok 3 ☐ Zarok 4
Tetanus	☐ Ez ☐ Hevpişk ☐ Zarok 1 ☐ Zarok 2 ☐ Zarok 3 ☐ Zarok 4	☐ Ez ☐ Hevpişk ☐ Zarok 1 ☐ Zarok 2 ☐ Zarok 3 ☐ Zarok 4
Xuraya avî	☐ Ez ☐ Hevpişk ☐ Zarok 1 ☐ Zarok 2 ☐ Zarok 3 ☐ Zarok 4	☐ Ez ☐ Hevpişk ☐ Zarok 1 ☐ Zarok 2 ☐ Zarok 3 ☐ Zarok 4

* Tenê bo zarokên hîn şîr dimijin di yeksaliya xwe de.

Ya girig bi kurtasî

- **Vakslêdan di her temenî de giring e.**
- **Vakslêdan bêyî pisporan jî pêşniyaz dibin** – Komîta herdem ya vakslêdanê (STIKO) li Elmaniya bi biryara fermî kar dike û her sal pêşniyazên vakslêdanê nû dibin, bi taybetî salnameya vakslêdanê.
- **Ewlekariya vaksînêdanê** – peymangeh û karmendên serbixwe fehs û çavdêriya qalîteyê, tenahiyê û bikaranîna vakslêdanê û dermanê vaksê dikin.
- **Bi giştî vakslêdan bêpere ye** – weha jî hemî vakslêdanên pêdivî yê ji hêla STIKO ve têne pêşniyarkirin û erkên sîgortayên fermî ne bo misogerkeran bêpere ne. Jibo dermanê vakslêdanê jî pêdivî nîne tu pereyan bidî.
- **Rewşa vakslêdan bide fehdsanê** – rewşa vakslêdana te û ya zaroka te li ba nojdarî bi rêkûpêkî- ya baş salê carekê- bide fehdsanê (pasa vakslêdanê bi xwe re bibe). Vakslêdanên hîn li xwe nedayî divêt bêne lixwedanê.
- **Vakslêdana parastinê jibo demên geştan amade bikin** – berya plankirina seredana an jî geştê *bi kêmasî* 6 heftiyên pêş seferê pêdiviyê rewşa vakslêdanê li angora welatê geştlêkirinê bête fehskirinê.
- **Di dema gucayî berya ducaniyê valkslêdan** – jinên ku di temênê zarokanîne de û bi taybetî digel destnîşankirina zarokxwestinê de, pêdiviyê berya wext vakslêdana parastinê ya xwe û malbata xwe bidin fehskirinê.



Tendurustî mercê herî giring e jibo mirov bixwe jiyanekê çalak bi rê ve bibe. Vaksîlêdan rêyek e asîh e, jibo hemî mirovan bi hemî temenan daku wan ji nexweşiyên vegirtinê biparêze. Bi vî rengî herkes dikare – û bi hêzeke kêr- tiştekî bo tendurustiya xwe bike.

Ev rênasa li ber we bitaybet jibo penaberan e. Di destpêkê de xizmeta bervêkirin û çivirkirinê dike daku berê xwe bidin pirsên pratîk wek pîrsa ka ev vaksîlêdan buhayê wê çend e, taybetmendiya wê jibo ducaniyê çi ne an jî piştî vaksîlêdanê çi serederî pêdivî ye bibe.

Bi alîkariya plana vaksîlêdana kesayetî û salnameya vaksîlêdana 2017an xwendeva dikare zû destnîşan bike, ka endamên malbata wî jibo parastina mukum ya malbatê vaksîlêdan li xwe dane. Hun dikarin adrêsen rêxistinên bibgehî û şîrovekirinek giring li ser têgehên pisporî bibînin.

Doxtorê te dimîne mirovê te yê bingeîn bo pîsên vaksîlêdanê.

Rênasîna „Vaksînlêdana parastinê“ dikare li ser vê navnîşana tora internetê www.mimi-bestellportal.de bête daxistin an jî wek behevokekê bête nuxumandin.

Ev Rênas têtê belavkirin ji hêla: